

Bi boneya lidarxîtina mehrecana helbesta Kurdî, kovara Pirs û weşana Newroz , ev namên jêrîn bi rêkiribûn:

Nama Pirsê

Silav û Rêz..

Eger wêje gulîstan e, helbestvan perwane ye, ji her gulekê bîn û rengan dibe, tovên wan tevlehev dike û gul û reng û bînên herî ciwan û nazik bi pêlên hestên xwe dafrîne û bi ezmanê mirovatîyê de berdide.

Em bawer dikin ku her helbestvaekî Kurd Perwanke evîndar e, gul û rengên herî dela di gulîstana wêje û bêjeya Kurdî de dafrîne û hêviyên jiyanê azad bilintir dike.

Em bi navê kovara “Pirs”, komîta amadekar a Mehrecana Helbesta Kurdî û helbestvan û hemî beşdarên dilsoz silav dikin û paşerojêke serkeftî ji peyva ciwan û ji zimanê Kurdî yê şêrîn re hêvî dikin...

Kovara Pirs 22.10.2008

Nama Newrozê

Biraderên hêja ...

Helbest beşeke fereh û pir giring e ji wêje, ew kane bibe nînika ziman, raman, civak, şaristanî, dîrok, sirûşt û her tiştên din... kane bawerî û hêviyên kes, civak û miletan jî bi şêweyên herî zelal diyar bike.

Bêje hespên rewan in, helbestvan jî siwarên di meydana demê de ne, ne bêje ditebitin û ne dem radiweste û herwiha divê helbestvanê bêjeya Kurdî jî herdem di wê meydanê de be û ji pêşbirka helbestvaniyê ya diwar qet venekşê.

Birastî em gelek xemgîn bûn

wekî ku bûye çend sal Mehrecana Helbesta Kurdî li Sûryê li dar nakeve, ji ber wê jî em vejandina Mehrecanê gaveke pir hêja û pîroz dibînin. Em bi navê weşana “Newrozê” komîteya amdadekar pir spas dikin û ji dilûcan de serkeftinê jêre dixwazin.

Ebdile Mele Silêman

Koça xwe ya dawîn bar kir

Roja Şemiyê 27.09.2008 Z, xelkên bajarê Qamişlo, bi dilekî kul û şikestî, cendekê

welatparêzê kurd **Ebdile Mele Silêman** di goristana **Qidûr Begê** de veşartin.

Buhuştî Ebdile, sala 1937an di



malbateke weltperwer de jidayik bûye, bi armanca pêkanîna jiyanê azad û bi rûmet ji gelê kurd re, wî gelek sal ji temen û cuwaniya xwe di kar û xebata rêxistinî de derbas kirine. Di sala 1966an de, ew tevî birek xortên kurdan digel bavê xwe Mele Silêman û birayê xwe **Salihê Mele Silêman** di ber doza gelê xwe de tene zindankirin û wan di zindanê de berxwedaneke berbiçav nîşan dane.

Cihê wî buhuştê rengîn be, serê malbat, meriv û hogirên wî sax bin